

Qaideyên nav malê yê kempa penaberan

Wek rûniştvanê kempa penaberan, divê tu qaideyên nav malê bişopîni. Ew hatine nivîsandin da ku tu û rûniştvanên din jiyaneke ewledar û baş li kempê bijî.

1 Bêdengî, nîzam û ewlehî

Divê li kempê bêdengî hebe ji se'et 23.00 heta 06.00 an.

Divê tu kesên din aciz nekî û bi awayekî ne baş li hember wan tevnegerî. Tundûtûjî ('inf), xirakirin an jî sûcên din dê ji UDI re werin ragihandin, û wê giliyê kesên sûcdar li cem polîs were kirin.

Divê tu li cihên mişterek (hevpar) meşrûbê venexwî.

Divê tu cixare, nergîlê û cixareyên elektronî li cihên mişterek an jî li odeya xwe nekêşî.

Destûr tune ku tu heywanên kedî li kempa penaberan vehewîni.

Divê tu xwe hîn bikî ka divê tu çî bikî eger krîzek çêbibe an jî agir bi kempê bikeve.

2 Bikaranîna ode û amûran

Divê tu odayên mişterek û qada derve paqij bikî. Divê tu miqate bî ku bisîklet, erebokên zarokan û alav û hacetên din rêyên revê asteng nakin.

Divê tu oda xwe paqij bikî û bidî hev.

Divê tu gemara xwe ji çavkaniyê ji hev veqetîni û bavêjî sindoqên gemarê.

Divê tu odayên mişterek ên hundir bi rêkûpêkî paqij bikî. Lîsteyek hatiye çêkirin ku dide xuyakirin kengî dora te ya paqijkirinê ye. Dema ku dora te were, divê tu paqijiya lazim bikî.

Divê tu makîneyên şuştinê, alavên metbexê û alavên şuştinê wekî çawa di pirtûkên bikarhêneran de hatiye, bikar bîni.

3 Serdanên şevê

Divê tu her gav ji kempê bipirsê gelo tu dikarî mêvanên şevê vehewîni yan na.

Kemp dikare ji vehewandina mêvanên şevê re bêje na.

Ew kesê ku dê li cem te raze, divê li Norwêcê bijî û nasnameya xwe an jî kerta penaberan şanî karmendên kempa penaberan bike.

Dema ku mêvanên te yê şevê hebin, divê hun rihetiya rûniştvanên din yê kempê li ber çavan bigirin.

Tu bi xwe berpîrsî ji dabînkirina xwarinê û nivînan ji mêvanên xwe re.

Kesên mezin dikarin zarokên xwe, û heval û endamên malbatê yê ku li kempê penaberan yê din dijî, bi şevê li cem xwe vehewînin.

Zarokên di bin 18 salan de dikarin dêûbav, xwişk û birayên xwe û hevalên xwe yê hevtemen, bi şevê li cem xwe vehewînin.

4 Barkirin ji kempê

Divê oda te an appartmana te bi tevahî hatibe paqijkirin û şuştin berî ku tu wê teslîm bikî.
Dema tu ji kempê derkevî divê tu mifteyên xwe teslîm bikî.

Tarîx

Imze